Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :875 27-Hezîran- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165




# Bê henek, kî berpirsiyar e




Filmek û Dîmenek
Film: Eyna Bejnê
Derhêner: Xelîl Dag
"Eger rûyê te çelûxwar be, neynikan sûcdar neke."
Gerîla dilîze.
Gerîla film çêdike.
Gerîla rextê sînematografiyê li hunerê girê dide û çalakiyên sînemayî pêk tîne.
Eyna Bejnê, bejin û bala me ya sînemayê dipîve.
Gerîla di eynê de li xwe dinêre. Em di eynê de li gerîla dinêrin. Eyneya Xelîl, filmê Xelîl, çavê Xelîl... Gelo ji bilî wan kê ji me bi çend salan di eyneya bejnê de li xwe nenêriye? Lê li keçikeke piçûk bifikirin ku qet bejna xwe di eynê de nedîtiye. Çend gerîla ji bo Sakîneya piçûk ketine kemîn û xeteran, da eyneyeke bejnê bînin wargehên gerîla. Vê peywîrê, weke çalakiyeke pîroz dibînin û pêk tînin.
Sakîneya piçûk wê cara yekê li ber eyna bejnê li xwe binêre. Hevalên wê ji bo vê rewşê xwe amade dikin. Sakîne li çiya mezin bûye û her li çiyê bûye. Ji ber wê rojekê dixwaze xwe di eyna bejnê de bibîne. Hevalên wê jî vê daxwaziya wê pêk tînin. Film bi pevxistineke cihê hatiye dirûtin. Mijara film jî mijareke resen e û wek fikir baş hatiye amadekirin. Di sînemaya Kurdan de ev rêbaz hema hema nehatiye bikaranîn. Li çiya, di nava wan şert û mercan de encameke serketî derketiye. Bila hin sînemavanên deştê qet xwe aciz nekin, em bi gelek derfetên li ber dest, nikarin filmekî wisa çêkin. Di vir de ya girîng raman e. Hêz û hest e. Lêhûrbûna sînematografiyê ye. Mirov dikare bibêje, eyneya wan ya sînemayê ne çelûxwarî ye, tersê wê dîmenên film birêkûpêk in. Çîrok di şiveriyên çiyan de diherike û li ti cihî naale. Cihên diale jî me zêde aciz nake.
"Rast e, ji çelûxariya rûyê xwe em, lê ji çelûxariya rûyê mirovayiyê kî berpirs e gelo?"
Ji dil jî kî berpirs e?
*Ozgûr Polîtîka*

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | M | A | M | I | K | ■ | L | A | M |
| 2 | ■ | L | ■ | R | E | N | Î | ■ | Î |
| 3 | B | E | L | ■ | L | A | M | A | ■ |
| 4 | A | M | A | D | E | ■ | A | L | Î |
| 5 | L | ■ | P | A | P | A | ■ | A | C |
| 6 | I | R | A | ■ | O | D | E | ■ | A |
| 7 | N | ■ | Z | E | R | ■ | S | E | D |
| 8 | D | E | ■ | N | ■ | S | A | W | ■ |
| 9 | E | ■ | B | E | L | Ê | ■ | K | Î |

## Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Dema mirov şîr bidoşe û dest nede tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Genimê hêrayî... Pirsek di rewşa ne tewandî de
2. Êsîr... Serbest, ne kole
3. Bêjinga ku dexlê ji hev diqetîne
4. Rengek
5. Notayeke mûzîkê... Rengek
6. Tişta ku pê debar tê kirin... Diravên ku ji aliyê dewletê ve ji welatiyan tên girtin
7. Dinya, cîhan... Kurtiya elementa hesin
8. 12 meh yan jî 365 roj... Beranê 1-2 salî
9. Li gorî baweriyên olî mirovê ku ewilî ji aliyê Xwedê ve hatiye afirandin û pêxemberê pêşî... Bal

**JOR-JÊR**

1. Madeya ku ji hêmanekê tenê pêk hatiye... Darê ku hikumdar û mirovên dînî weke sembola hêzê bi kar tînin
2. Beşeke malê, jor... Kurtiya ajansa fermî ya Tirkiyê... Qewmê ji ber guhnedana pêxemberê xwe hatî tinekirin
3. Roja em tê de ne... Awayekî dansê, babetek ji şanoya mûzîkal
4. Beyreq, sembola welatan... Notayek
5. Textikê reş yê ku nivîs li serê tê nivîsîn
6. Bi rûsî erê... Notayek... Di dîrokê de dewleteke Kurdan
7. Cihê lêdanîna koçeran... Pirsek di rewşa tewandî de
8. Cînava pirsê ya ku tê wateya; li kû ye?... Bazirganê ku zad dikire û difiroşe
9. Bajarekî me... Eyd

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Aktîf** (Fransî) | **Çalak, bibandor, zindî, bilivûtevger, şixulker. Kesê pir dixebite: Ev nivîkarekî aktîf e** |
| **Arşîv** (Fransî) | 1. Cihê ku kovar, rojname, wêne û berhemên din tê de tên parastin. 2. Materyalên ku tên parastin. |
| **Arkeolojî** (Fransî) | Zanista kolanê, şûnwarnasî, vekolîna dîrokê bi riya tiştên ji serdemên berê ve di binê erdê de mayîn û pişt re hatîn dîtin. |
| **Aktivîst** (Fransî) | Çalakvan, çalakker. |
| **Ekolojî** (Fransî) | Şaxekî zanistê ku li ser têkiliya zindiyan hem ya di navbera wan de hem ya bi derdora xwe re hûrgiliyê dike. |
| **Hevpar.** | Hevbeş, hevpişk, şerîke, şirket. |
| **Hevkar** | |
| **Konsept** (Fransî) | 1. Têgîn. 2. Têgihîştin, nêrîn, fikir. 3. Rêbaz. 4. Pergal. |
| **Rêgeh.** | 1. Cihê ku rê tê re derbas dibe. |
| **Siruşt.** | Xweza, tebîet. |

## Tûrikê çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser gund heye. Berê piraniya mirovan li gundan dijiyan. Gund, bi taybetî ji bo zarokan pir xweş bûn. Bi hev re dilîstin. Bi hev re avjenî dikirin. Rojên cejnan bi hev re malbimal digeriyan. Bax û bostanên gundan hebûn. Rez û pez hebûn. Diçûn çolê. Di nava giya û kulîlkan de baz didan. Bi kurt û kurmancî keyf ew keyf bû. Em binêrin ka sirûda me ya li ser gund çawa ye.***




Meyzeke ezmana
Wa ye stêrek geş heye

Li rasta wê stêrê
Welatek pir xweş heye

Ew welat welatê
Bav û bapîrê me ye

Di nava deştê de
Çiyayek bilind heye

Ew çiya çiyayê
Bav û bapîrê me ye

Li pişta wî şaxî
Gundek gelek xweş heye

Li bîr be ew gundê
Bav û bapîrê me ye

Li pişta wî gundî
Bax û bostan pir hene

Ew bax û ew bostan
Bostanên gundê me ne

Li pişta bostanan
Goristanek gir heye

Ew gor û goristan
Tev ya şehîdê me ye



# 389 leşkerên dagîrker hatin kuştin

HPG'ê ragihand ku di nava 2 mehan de gerîlayên azadiyê li dijî dagîrkeran 288 çalakî kirine, di van çalakiyan de 389 leşker hatine kuştin û dewleta tirkî ya dagîrker 17 caran çekên kîmyayî bi kar anîne.*R-2*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 875 27-Hezîran- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## "Bingehê siyaseta Tirkiyê qirkirina gelê azadixwaz e"




Li hemberî êrişa 17'ê Hezîranê ya ser avayiya Partiya Demokratîk ya Gelan (HDP) ya li Izmîrê ku di encamê de Deniz Poyraz şehîd bû, bertek dewam dikin. Rûken Ehmed diyar kir ku, ji ber jin li hemberî desthiladaran disekine û doza avakirina jiyaneke hevbeş dike, rastî êrişên faşîzmê tê. *R-3*

# BAŞÛR JI DAGÎRKERAN RE DIBE GORISTAN




## "Itîlaf ji bo pêkanîna berjewendiyên Tirkiyê alavek e"



Endama Meclisa Serokatiya MSD`ê Fehîme Hemo got, qaşo Itîlafa Sûrî ya neniştimanî veguherîye alaveke sîxuriyê. Derbasî herêman dibe û xizmeta dewleta tirkî ya dagîrker dike.*R-4*

## "Tecrîda li ser rêbertiyê tecrîda li ser tevayiya mirovayiyê ye"



Zelal Ceger: Dewleta tirkî dixwaze bi tecrîda girankirî ya li ser rêber Apo, fikrên azad ji holê rake. *R-5*

## "EMÊ BIBIN RONIYA PAŞROJÊ"



Cara yekê li herêma Cizîrê ezmûnên refa 12an bi zimanê kurdî tên kirin. Ji bo gelê Kurd yê li Rojava ev gaveke dîrokî ye. Ji destpêka aloziya Sûriyê ve mîna vê gavê li herêma Cizîrê nehatine avêtin. *R-6*

**Dema Xunav Dibare**
Sîpan Şînda *R-7*

**Şerê Veşartî**
Faruk Sakik *R-5*

**SÛRÎ BER BI KÛ VE DIÇE?**
Ednan Muştafa *R-7*

# 389 leşkerên dagîrker hatin kuştin

HPG'ê ragihand ku di nava 2 mehan de gerîlayên azadiyê li dijî dagîrkeran 288 çalakî kirine, di van çalakiyan de 389 leşker hatine kuştin û dewleta tirkî ya dagîrker 17 caran çekên kîmyayî bi kar anîne.



Navenda Ragihandin û Çapemeniya HPG'ê bîlançoya 2 mehan ya Pêngavên Bazên Zagrozê û Cenga Xabûrê eşkere kir. Bîlanço wiha ye:

"Şeva 23'yê Nîsanê li hemberî qada Avaşîn, Metîna û Zapê yên başûrê Kurdistanê tevgera dagîrkerî hatibû destpêkirin. Li hemberî vê dagîrkeriyê hêzên me dest bi Pêngavên Şoreşgerî ya Cenga Xabûr û Bazên Zagrosê kiribûn. Vê pêngavê du mehên xwe tijî kirine. Di berxwedana 60 rojan de, gelek mînakên berxwedana destanî û qehremaniyê hatine nîşandan.

Bîlançoya şerê du mehan ya Pêngavên Şoreşgerî ya Cenga Xabûr û Bazên Zagrosê wiha ye

Çalakiyên ji aliyê hêzên me ve hatîn kirin;

– 2 çalakiyên kemînê
– 9 çalakiyên xweberdana nava dijmin
– 14 çalakiyên hevdemî û bi koordîne
– 17 çalakiyên lêdana derbê
– 35 çalakiyên sekvaniyê
– 59 çalakiyên bi çekên giran
– 66 çalakiyên sabotajê
– 86 çalakiyên êrişê
– Bi giştî 288 çalakiyên gerîla hatine kirin.

Encama çalakiyên hêzên me;
– 389 dagîrker hatine cezakirin.
– 47 dagîrker birîndar bûne.
– 54 hevriyên me şehîd bûn.

Çalakiyên Hêzên Parastina Hewayî yên Şehîd Delal;
– 39 çalakiyên hêzên parastina hewayî hatine kirin.

Êrişên ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve hatîn kirin;
– Li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê hema hema her roj bi obûs, bombeyên xarik, hawan, bi helîkopter û balafirên şer bi sedê caran bombebaran hatine kirin. Artêşa tirkî ku bêencam ma li qadên ku lê ye hem dar birîn, hem jî bi riya hin şerîkeyên hevkarên xwe daristan talan kirin, bi bombebarana ku dibe sedema şewatê agir berda gelek daristanan.
– 62 carî hewl da bikeve nava tûnelên şer.
– Li dijî tûnel û çeperên şer 17 caran çekên kîmyayî û gaza bijehr bi kar anîn.

Wesaitên dijmin yên ji hêzên me derb xwarîn;
– 2 wesaitên leşkerî
– 3 kepçe
– 6 drone
– 6 helîkopter

Amûrên leşkerî yên ji aliyê hêzên me ve hatîn roxandin;
– Wesaiteke leşkerî ya bi tîpa transît
– Wesaiteke leşkerî ya bi tîpa kirpî
– Wesaiteke bi komanda ji dûr ve ya bipalet
– Wesaiteke bi tîpa Reo
– 2 wesaitên leşkerî yên normal
– 2 çekên A4 û çepera wan
– Kamelyayek
– Dûrbîneke teleskopê
– 3 kon
– 3 drone
– 4 radar
– 9 kamerayên mobesse
– Mertalên fîşek li wan naçe
– Bi dehan çeper hatin imhakirin.

Alavên leşkerî yên hêzên me ji ser dijmin rakirîn;
- Cîhazeke bêtêl
– Çekek MPT
– Çekek Bombeavêj
- Çekek BKC
– Çekek B7 (Bîsîvîng)
– Dûrbîneke rojê
– Dûrbîneke termal
– 2 dûrbînên çekê
– Detektoreke mayinan
– Dronek
– 6 çenteyên leşkerî
– 650 kîlo teqemenî
– Kûnyeyên leşkeran
– Gelek pêdiviyên leşkerî."

***Çavkanî-ANF***


## Çarenûsa girtiyên di destê PDKê de hê ne diyar e

**Rewşa 3 endamên PYD'ê û nûnertiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ya bakur û rojhilatê Sûriyê ya li başûrê Kurdistanê ku li Hewlêrê hatibûn destgîrkirin, ev 18 roj in ne diyar e. Herwiha rewşa ciwanekî ji Rojava ku ew jî li Hewlêrê hatibû girtin, nayê zanîn.**

10'ê Hezîrana 2021'ê nûnerê pêwendiyan yê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) yê Hewlêrê Mistefa Osman Xelîl, nûnerê Rêveberiya Xweser yê Hewlêrê Cîhad Hesen û endamê PYDê yê Hewlêrê Mistefa Ezîz Mistê saet 03:00'an dem adiçûn pêşwaziya mêvanên xwe, li balafirgeha Hewlêrê ji aliyê hêzên PDK`ê ve hatibûn destgîrkirin.

Tevî ku di ser destgîrkirinê re 18 roj derbas bûne jî, hê agahiyek ji her siyan nehatiye girtin û têkildarî mijarê ti zanyarî ji bo PYDê û Rêveberiya Xweser nehatine dayîn.

Di heman roja destgîrkirinê de rêveberiya PYD'ê bi daxuyaniyekê nerazîbûn nîşanî vê kiryarê dabû û gotibû, di demekê de ku ji bo diyaloga nava partiyên kurdî hewldan çêdibin, destgîrkirin pêk hatiye. Ev jî nahêle hewldanên diyalogê bigihin encamê û PDK ji vê berpirs e. Herwiha ev kiryar xizmeta dijminan dike. Heta niha têkildarî destgîrkirinê ti agahî ji me re nehatine dayîn."



22'yê Hezîranê jî nûnertiya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê ya başûrê Kurdistanê bi daxuyaniyekê ji hikumeta Başûr xwestibû ku rewşa endamên hatîn girtin, zelal bike. Li aliyê din rewşa ciwanê bi navê Ciwan Ebdulkerîm jî yê ji rojavayê Kurdistanê ku li gel dayîka xwe ya nexweş ji bo tedawiyê çûbû başûrê Kurdistanê û li deriyê sînor yê Pêşxabûrê hatibû girtin, ev 20 roj in nayê zanîn.

***ANHA***



## Dîmenên çalakiya hewayî ya gerîla

**Dîmenên çalakiyeke Hêzên Parastina Hewayî yên Şehîd Delal ya li Avaşîn pêk hatî, ji aliyê Gerîlla TV ve hatin weşandin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkildarî çalakiya gerîla ev agahî dabû:

"Hêzên me yên Parastina Hewayî yên Şehîd Delal 11'ê Hezîranê saet di 09:00'an de li herêma Avaşîn li dijî dagîrkerên li ser qada Kîlîse çalakiyeke hewayî kirin. Bi rengekî serketî derb li hedefa diyarkirî, hat xistin."

***https://gerilatv.com/uploads/videos/b6a0a936c_1080.mp4***

## Li Minbicê 4 çeteyên Tirkiyê hatin kuştin

**Navenda nûçeyan**

**Hêzên Meclisa Leşkerî ya Minbicê hewldanên çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker têk birin. Di encamê de şer derket û 4 çete hatin kuştin.**




Navenda Çapemeniyê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê ragihand ku çeteyan hewl da derbasî nuqteyên şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê yên li gundê Toxar yê bakurê rojhilatê Minbicê bibin, lê şervanên meclisê bersiv dan û di encamê de şerekî dijwar qewimî. Di şerê derketî de 4 çete hatin kuştin û yên din jî reviyan.

## Bîranîna şehîdên meha Nîsan, Gulan û Hezîranê

**Meclisa Malbatên Şehîdan û malbatên şehîdan li navçeya Amûdê ya kantona Qamişlo 40 şehîdên di dem û salên cuda de şehîd bûyîn, bîr anîn.**



Meclisa Malbatên Şehîdan ya Amûdê ji bo bîranîna 40 şehîdên di meha Nîsan, Gulan û Hezîranê de, di pêngavên li dijî çeteyên DAIŞ'ê û êrişên dewleta tirkî de şehîd bûyîn, merasimek li dar xist.

Bi dehan endamên saziyên civaka sivîl ya Rêveberiya Xweser û malbatên şehîdan yên li navçeyê tevlî merasima li Hola Kerem hatî lidarxistin, bûn.

Bi her çar dîwarên hola merasimê ve wêneyên cangoriyên azadiyê, alên Yekîneyên Parastina Gel (YPG), Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û Meclisa Malbatên Şehîdan hatibûn daleqandin.



Endama Meclisa Malbatên Şehîdan ya Amûdê Şîlan Silêman tevayiya cangoriyên azadiyê bîr anîn û got, bi sedan zarokên Amûdê di riya parastina gel, xaka xwe û rizgarkirina herêmên xwe ji çeteyên DAIŞ'ê, canê xwe feda kirin. Em malbatên şehîdan jî emê riya wan bişopînin û destkeftiyên wan heta dawî biparêzin."

Di dawiya merasimê de, wesîqeyên şehîdan hatin xwendin û radestî malbatên wan hatin kirin.


***ANHA***

## Civîneke nû li ser aloziya li Sûriyê

**Rûsya dema civîneke nû ya ji civînên Astana yên taybet ji bo Sûriyê ragihand û diyar kir ku wê civîn dawiya meha Tîrmehê li paytexta Kazakistanê Nûr Sultan li dar bikeve.**

Cîgirê serokê Rêveberiya Operasyonên Sereke ya Desteya Erkana Giştî ya artêşa rûsî Jaroslav Moskalek, dema tevlî dewreya 9`an ya Kongreya Moskova ya Ewlekariya Navneteweyî bû got, em bi awayekî çalak tev digerin da ku aloziya Sûriyê di çarçoveya formata Astana de çareser bikin, ku wê di 6-8'ê Tîrmehê civîneke nû li Nûr Sultan li dar bikeve.

Civîna 15`an ya diyalogên rêgeha Astana 18`ê Sibata 2021`ê bi daxuyaniyekê bi dawî bû ku ji daxuyaniyên civînên berê cudatir bû. Nexasim bi bendên girêdayî serweriya Sûriyê û serxwebûna wê, ya girêdayî peymana agirbestê ya li herêmên bakurê rojavayê welat e. Li aliyekî din jî garantorên mijarê Rûsya, Tirkiye û Îran dixwazin serweriyan li hev parve bikin û erdê Sûriyê jî dagîr bikin.



***ANHA***



# Li Rojava şoreşa perwerdeyê -xelek 1-



Îro dilê Kurdan tevan bi Şoreşa Rojava re lê dixe û dengê wan ji bo Rojava bilind dibe. Pêvajoya şoreşê pêvajoya afrîneriyê ye. Ji jiyana şkestî û nîvco, ji kavilan, ji wêranxaneyan û ji bermayiyên tofanê mirov jiyan û cîhaneke nû hildiberînin. Li Rojava jiyan pêş dikeve, cîhan tê bilindkirin. Me jî xwest em di çarçoveya Şoreşa Rojava de dêhn û bala xwe bidin perwerdeya li Rojava pêş dikeve. Ji bo wê emê pêşiyê guh bidin pêşengdahêner û mamosteyên pergala perwerdeyê ya Rojava. Mamosteyên Zanîngeha Kobanê wê ji me re behsa Zanîngeha Kobanê bikin. Mamoste Şervan Muslim ku Endamê Desteya Rêveber ya Zanîngeha Kobanê ye û mamoste Egîd Nasro ku Hevserokê Fakûlteya Wêje û Zimanê kurdî ye wê bibin mêvanên hevpeyvîna me. Ji bo alîkarî û piştgiriya Berpirsa Odeya Têkiliyên Derve Xunav Îsa jî em spasiyên xwe dikin.



Destpêkê dixwazim bipirsim ka bandora Şoreşa Rojava li ser perwerdeyê çawa çêbû? Ferq û cudayiyên çawa di navbera pergala perwerdeyê ya berî şoreşê û ya piştî şoreşê de hene?

Şervan Muslim: Çawa ku tê zanîn şoreş di mefhûmê xwe yê bingehî de jî guhertinek e. Ango guhertina rewşekê bi rewşeke din e. Mirov ji rewşekê derbasî rewşeke din dibe. Ew guhertin jî piralî ne. Em baş dizanin ku Şoreşa Rojava gelek şoreş di nava xwe de hewandin. Di nav xwe de şoreşa jinê, şoreşa ziman, şoreşa ciwanan hewandin. Şoreşa ziman yan jî bi giştî şoreşa perwerdehê ji bo gelê me şoreş û vejîneke nû bû. Nexasim ji bo gelê Kurd yê li rojavayê Kurdistanê.

Di eslê xwe de pergala perwerdeyê ya berî Şoreşa Rojava ya li Sûriyê bi ser me de dihat sepandin, xwe dispart hin xalên bingehî yên şovenîzmê. Meseleya nijadperestiyê tê de li pêş bû, meseleya yekzimanî, yekkçandî tê de li pêş bû. Em di binê sîwaneke bi vî rengî de dijiyan û li gorî van xalan em dihatin perwerdekirin.

Li rojavayê Kurdistanê bi ser Kurdan û ser gelên din yên weke Suryan, Aşûr, Çerkez, Ermen û hwd. de dihat sepandin ku perwerde û zanistê bi zimanê erebî fêr bibin û bigirin. Herwiha çanda ku pêwîst bû bû zanîn çanda Ereban bû. Lewra nasnameya me qedexe bû. Me nikariya bi zimanê xwe deng bikin.



Di gel vê çawa ku tê zanîn, Kurdan ji dîroka xwe ve dagîrkerî nepejirandine û dembidem li hemberî dagîrkeriyê serî rakirine. Bi wê re jî çand û zimanê kurdî her tim di nava dil û hinavên me de bûn. Tim xeyalê me bû ku em rojekê bikarin bi zimanê xwe deng bikin, bi zimanê xwe perwerde bibin, herwiha çanda xwe ji nêz ve nas bikin. Lê bi awayekî eşkere me nikariya ev bianiya ziman jî.

Zanîngehên ku me di wan de dixwend, li gorî hişmendiya dewletê bûn. Lê bi demê re li Rojhilata Navî tevgerên gel dest pê kirin. Çirûska van tevgeran derbasî Sûriyê jî bû. Sûriye dewleteke wisa bû ku pêwîst bû şoreşek lê çêbe. Lewra zilim, zor û nijadperestî pir zêde bû. Li ser vî bingehî sala 2011-2012'an gelê Sûriyê jî dest bi doza azadiya xwe kir. Em gelê kurd yê li rojavayê Kurdistanê jî ji bo doza azadiya xwe hişyar bûn. Em jî xwedanên felsefeyekê bûn ku me cihê xwe di vê şoreşê git. Me di aliyê siyasetê de xeta 3. Hilbijart. Li ser vê me rêxistina xwe damezirand û me di her qadê de xwe bi rêxistin kir. Meseleya perwerdeyê û meseleya ziman jî ji van qadan bûn. Me bi tîpên kurdî, bi sazî û dezgehên kurdî, bi xwendekaran dest pê kir. Lê dû re me dît ku em gihîştine wê astê ku pêwîst e êdî em li vir zanîngehan vekin û bi zimanê xwe perwerdeya xwe bibînin. Lê ev ne ji bo zimanê kurdî tenê bû, me ev ji bo zimanên gelên din jî bû. Ji bo wê ferqeke pir mezin di navbera perwerde û pergala berî şoreşê û piştî şoreşê de heye.

Li ser mijarê ferqeke mezin jî ev bû: Tevayiya dîrokê bi awayekî berûvajî dihat fêrkirin, herwiha zanist jî li gorî xizmeta desthilatdariyê dihat dayîn. Bi zimanekî tenê dihat dayîn. Zarokan dema dest bi dibistanê dikir nikariyan xwe bînin ziman. Lewra zimanê ku mamoste pê diaxivî û fêr dikirin ne zimanê wan bû.

Kurdên me yên li rojavayê Kurdistanê pir jîr bûn û ji nava wan gelek kesên navdar derketine. Lêbelê ji ber ku zimanê em pê dihatin perwerdekirin ne zimanê me bû, di nava me de xweragirtin tim hebû. Ev hemû ji bo me bûn tecrûbe. Ji ber wê me zimanê xwe bi ser gelên din de nesepand. Me li gorî paradîgmaya neteweya demokratîk pergala xwe ya perwerdeyê da rûniştandin. Piştî şoreşê gel tev li vir bi zimanê xwe perwerdeyê dibînin. Di pergala perwerdeyê de nijadperestî bi ti awayî nîne, dîrok li gorî heqîqeta wê tê şirovekirin, zanist ji bo xizmetgûzariya civakî tê şirovekirin.

...

***Bahadîn Akhan-XWEBÛN***





## Dema Xunav Dibare

Sîpan Şînda

Dema xunav dibare li ser wê pora te ya xelek, bêhna biharê difûre li ser gelî û newalên kûr. Hinga xunav dibare li ser wan biskên te yên liblibî, pîjanên terezinan ter dibin. Dema xunav dibare li ser wan keziyên te yên bi sebra dayîkên dilşewat hûrik hûrik hatîn hûnandin nêrgizên latan geş dibin, ew kulîlkên wan yên çilmisîn û sernixwîn bûyîn vedigerin li ser hemdê xwe û ji nû ve jiyan li bîra wan tê. Dema xunav li ser wê eniya te ya kever de dibare û tipik ji wê difina te ya zînî ber bi erdê ve diherikin, reşrihanên kelebestan yên di çilê havînê de li ber germa Cizîra Botan histoxwar bûyîn ji nû ve serî hildidin. Dema xunav li ser wê bejna te ya zirav û dirêj de dibare, gulên bêhnxweş bêhna xwe mîna pêlên çemê Firat û Dîcleyê bi ser deştên welatê min de direşînin.

Belê dema xunav dibare, ez dizanim ku te çarika reş li xwe pêçaye û di bin wê çarika reş de derketî li nava kolanên Cizîra Botan û weke Zîna Zêdan xwe dihejînî bi wan çavên xwe yên reş yên kilkirî mêran dikujî û berg û dilê xortan dihelînî. Dema xunav dibare ez dizanim tu di wê germa Temûz û Tebaxê de derketî li ser kavilên bav û kalan û hestiyên zarokan dijimêrî. Dema xunav dibare ew tîrêjên rojê xwe ji deşt û çiyayên welatê min vedikişînin û bi tîna dilê te agirê sobeyên sêwiyan gurr dibe.

Erê xunava min, bihara dilê min, bêhna bihara min, berfhelîna zozanên min, kulîlka siberojên min…

Çîroka jiyana min, keyf û şahiya dilê min, xemrevîna min, helbesta vîna min, zimanşîrîna min, awaza zimanê min, cerghelîna min, dilbikula min, dilovana min, pîvoka li qûntarên çiyayên min, xeml û xêla welatê min…

Xunav î, gulav î, xweş nav î…

Lê ka êdî nema dibarî, nema kulîlkên qermiçî, ji têhna hişk û ziwa bûyîn geş dikî, nema bêhna biharê xweş dikî, nema bêhnê berdidî li ser axê û li ser dar û beran de difûrînî…

Nema avên kaniyên nîvçik boş dikî, nema pelên darên hehl û rezan geş dikî…

De bibare wa hêviya kewgîrvanên dav vegirtîn û li benda xurîna ribatî di kolika xwe de hişk û req bûyîn…

De bibare wa hêviya cotyarê li benda tilbîsa mayî û tovê xwe li erdê ne reşandî û mêşik lê kar ketîn…

De bibare wa hêviya dotmamê ya heft salan li benda pismamê çûyî riya nehatinveyê mayî û hêviya wê di dilê wê de bûyî kuleke bêderman li der dayî…

De bibare wa hêviya teyrikên di hêlînê de li ber firê ketîn…

Dema tu nebarî wê kevotên berojan nema şîn bibin, wê darên mazî nema kurpe bidin, wê zarok nema gewlazên pîvokan histoyê xwe ve bikin û keçikên kamil wê nema tacekê ji pîvokên ter û nazik danin ser serê xwe…

Bibare wa hêviya kulîlkên bêhn xweş, bibare, bibare…

# “EMÊ BIBIN RONIYA PAŞROJÊ”

**Cara yekê li herêma Cizîrê ezmûnên refa 12an bi zimanê kurdi tên kirin. Ji bo gelê Kurd yê li Rojava ev gaveke dîrokî ye. Ji destpêka aloziya Sûriyê ve mîna vê gavê li herêma Cizîrê nehatine avêtin.**



**Darîn Silê/Qamişlo**

Îsal ezmûnên refa 12 de, 6 meha Hizîranê despêkir û wê 27 mehê xilas be. Lê cûdahiya ezmina îsal li herêma Cizîrê ewe ku cara yekem her xwandevanek ezmûna xwe bi zimanê dayîkê dibine.

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya herêma Cizîrê Rohat Xelîl, di derbarê mijarê de ji me re axivi û bîr anî ku ji 2015an ve li Efrîn



û Kobanê sîstema ku xwadevan bi zimanê dayika xwe ezmûnên xwe bikin pêk hatiye, lê cara yekê ye li herême Cizîrê ezmûnên refa 12an bi zimanê dayikê çêdibin û wiha dawami da axiftina xwe: “ezmûn îsal navendî tên dayîn, ji hêla desteya perwerdê hatibûn amadekirin. Herwiha ji bo her pêkhateyek, bi zimanê dayikê ezmûn tên dayîn. Pirsên ezmûnê jî li gor asta xwendekaran hatine dayîn, 30% hêsanin, 30 navîn û 40 jî yên zehmetin. Jixwe ezmûn ji 6` vê mehê ve dest pê kirine û wê di 27ê mehê de bi dawî bibin. Heta niha ezmûn baş tên dayîn.”

Rohat da zanin ku piştî du roj ji ezmûnê derbas bûn, komîteyê dest bi çareserkirina biranşan kir û axaftina xwe wiha domand: “Li gorî lîsteya çareserkirinê,komîteya ezmunan nîqaş dikin û ezmûnê di nirxînin. Heta niha du biranş hatine nirxandin. Li gorî nirxandina van biranşan bi giştî, ji sedî 70 xwendekar bi ser ketine. Biranşa bîrkarî hin zehmetî têde hebûn, ji ber wê asta xwendekaran têde kêm bû. Piştî ku ezmûn bi dawî bibin wê dewreya ezmûna dudiya destpê bike. Di vê dewreyê de mafê her xwendekarek heye ku, ji yek heta sê biranşan têde dûbare bike. Dewreya dudiyan hem ji bo xwendekarên ku di sê biranşan de bin ketin, hem jî yên ku bixwazin pileyên xwe zêdetir bikin e. Di pileyên dawî de, yê ku bi du piranşan de têk çûbe û bi her du riba pileyê bîne wê bi ser bikeve. Lê yê ku bi ser sê piranşan bin bikeve, ew mafê dewreya dudiyan na gire.”

Rohat Xelîl diyar kir ku li 64 navendan ezmûn tên dayîn û wiha pê da çû; “Navendên ezmûnan li bajarê Qamişlo, Girkê Legê, Dirbêsiyê û Hesekê ne. Ev bajar navendên sereke ne. Xwendekarên bajarên din jî, li van çar bajaran tevlî ezmûnan dibin. li her navendek yek berpirs û yek sekretêr heye. Di her refekê de jî du mamosteyên çavdêr hene.”

Hevseroka Desteya Perverdeyê Rohat Xelil di dawiya axiftina xwe de, di derheqê tedbîrên parastina xwendekaran, ji nexweşiya korona (Covid-19) jî wiha got: “Berî ezmûn dest pê bikin dibistanên ku ezmûn lê werin çêkirin tev hatin paqijkirin. li her dibistanekê du mamoste berpirsên tenduristiyê hene. Em tedbîrên pir cidî digrin. Di refan de jî, dûrbûn di nava xwendekaran de heye, her xwendekarek di maseyekê de cih digre. Ji bo rewşên awarte jî li ber her dibistanek erebeyek tenduristiyê heye.”

**“EMÊ BIBIN RONIYA PAŞROJÊ”**

Têkîldarî mijarê xwendekara bi navê Evîn Ebdo keyfxweşîya xwe ya ji ezmûnên bi zimanê dayîka xwe bi ziman kir û gotinên xwe wiha bi lêv kir: “Ez di beşa wêjeyî de dixwînim. Pir kêf xweş dibim dema ezmûnê bi zimanê xwe yê dayikê dibînim. Ezmûnên me serkeftî derbas dibin. Pirsên ezmûnê jî hêsan, lê carna di hin pirsan de astengî bi me re derdikeve. Ji bo wê hin pirsên ji derveyî pirtûkê bi me re derbas dibin, desteyê perwerdê jî wan zîl dike. Di ezmûnê de derûniya me rehete û di refê de jî mamoste bi awayekî baş çavdêrî dikin. Ez bihêvîme xwendekar tev li keda xwe xwedî derkevin, da ku em bibin roniya paşrojê.”

# “Armanca projeyê, dilxweşiya gel e”

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

**Projeya Yekîtiya Hunermendên Cizîrê ya lidarxistina şahiya li bajarê Qamişlo, îsal jî bi coşeke mezin tê pêşwazîkirin. Hevserokê Yekîtiyê Elî Ebdelah diyar kir ku armanc, dilxweşiya gel e û vê projeya xwe ya hunerî her sal li dar dixin.**





Yekîtiya Hunermendên Cizîrê projeya çalakiyên hunerî, ji 2018an ve li bajarê Qamişlo li Bexçeyê “Dirîm Land” bi armanca pêşxistina karê hunerê, herwiha ji bo dilxweşiya gel, ji heyva Hezîranê heta Cotmehê, şahiyan li dar dixe.

Ev çalakî her hefte roja Sêşamê tê pêşkêşkirin. Di çalakiyê de stiran tên gotin û pêşbirik tên lidarxistin. Roja şahiyê ji gelê Kurd, Ereb, Suryan û Asûr 3-4 hunermend derdikevin ser dikê û stiranên xwe ji gel re pêşkêş dikin. Ev çalakî ji saet 20an heta 22 yan dewam dike û heta dawiya havînê wê bi vî rengî dewam bike.

**Birfirehkirina projeyê di plana yekîtiyê de ye**

Hevserokê Yekîtiya Hunermendên Cizîrê Elî Ebdelah li ser vê mijarê wiha axivî: “Ev deh sal in gelê me di şer de ye. Ji bo ku em hinekî kêfê bixin dilê wan, ev sala çaran e em vê projeya xwe li dar dixin. Ji ber ku mûzîk beşek ji çand û hunerê ye û rola wê di civakê û kesayeta mirovan de girîng e, çalakiyên bi vî rengî bandoreke erînî li gel dikin.”

Elî Ebdelah diyar kir ku sala borî ji ber belavbûna Vîrûsa Korona, du şahî tenê li dar xistine. Elî got, eger îsal ti pirsgirêk ji wan re dernekevin, wê heta dawiya havînê van şahiyên xwe li dar bixin.

Elî Ebdelah axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Heta ji me were emê vê projeya xwe her sal li dar bixin. Ji destpêka projeyê heta niha ji ber kêmbûna derfetan, em li bajarê Qamişlo tenê vê çalakiyê li dar dixin. Lê me xistiye plana xwe ku di demên pêş de li tevayiya bajarên xwe bigerin û dilê wan jî xweş bikin. Em bi hêvî ne ku şahiyên me bi dilê xelkê me bin.”

**“Mûzîk mirovan ji rewşekê dixe rewşeke din”**

Welatiyê bi navê Bilind Osman li ser çalakiyên çand û hunerê bi taybetî li ser projeya Yekîtiya Hunermendan nerîna xwe wiha anî ziman: “Destpêkê ji bo vê projeyê spasiya yekîtiyê dikim. Lewra projeyeke serkeftî ye. Em keda wan ya ji bo kêxweşkirina me, ji bîr nakin. Bandora mûzîkê li ser mirovan pir e. Çimkî mirov çi kêfxweş çi xemgîn be, dema guhdarî mûzîkê dike, bandorekê erînî li kesayeta wî dike. Hêviya min ew e ku, hem ji bo pêşxistina çand û hunera civakê, hem ji bo derxistina gel ji xemgîniyê, projeyên bi vî rengî pirtir bibin.”






**Çavdêrê projeya hingaran diyar kir ku salên borî bi projeyên herêmî gelek encamên erênî hatin bidestxisitn û berhemên van projeyan daketin sûkên Til Temir û Hesekê. Herwiha bang li welatiyan kir ku sûdê ji van tecrûbeyan bigirin û pişta xwe bidin projeyên herêmî.**

Li gel dorpêça li ser herêmê û girtina dergehan ji aliyê hikumeta Şamê ve, li bakur û rojhilatê Sûriyê êdî projeyên piçûk bûne çavkaniya pêkanîna rêgeza xwexedîkirinê ku pêdiviyên welatiyan pêk bînin.

Projeya çandina sebzeyan di nava hingaran de rêgeza xwexwedîkirinê ji herêmê re peyda dike ku ji aliyê pirsporên çandiniyê yên navçeya Til Temirê ve hatine çandin.

Rûbera projeyê 5 donim e. 9 hingar tê de hene. Digel ku hilberîna wê baş e, çavdêrên projeyê hewl didin projeyê firehtir bikin da ku berheman zêdetir derxin û bişînin sûkên herêmê.

Çavdêrê projeyê Ismet Mihemed têkildarî mijarê got, ev 3 sal in me dest bi vê projeyê kiriye. Li gel dorpêçê encamên wê erênî ne.”

Mihemed axaftina xwe wiha domand: “Armanca me ew e ku em sebzeyên bênexweşî û bêhormon derxin û bihayê wan guncaw be.”



Mihemed herwiha bal kişand ser rêjeya serkeftina projeyê û wiha axivî: “Heta niha digel ku rêjeya serkeftinê hindik e, lê me gelek encamên erênî bi dest xistin. Piştî ku me pêwîstiya sûka navendî ya Til Temirê pêk anîn, me sebze daxistin sûkên Hesekê.”

Di heman demê de Mihemed da zanîn ku niha heftane li derdora 2 tonan bacanên sor û 2 ton xiyar jî dadixin sûkên herêmî û cureyên din yên sebzeyan dişînin sûkên derveyî herêmê.

Mihemed da xuyakirin ku hewl didin projeyê firehtir bikin û cureyên din mîna zebeşan biçînin da ku pişta xwe bidin çandiniya li herêmê û sebzeyan ji derve negirin.

Ismet Mihemed di dawiyê de bang li welatiyan kir ku berê xwe bidin projeyên wiha da ku rêgeza xwexwedîkirinê pêk bînin. Herwiha bang li welatiyan kir ku dikarin bêpere ji tecrûbeya wan ya di çandiniyê de sûdê bigirin. Lewra pêwîstiya herêmê bi projeyên din heye.

*ANHA*



# “Bingehê siyaseta Tirkiyê qirkirina gelê azadixwaz e”

**Li hemberî êrişa 17’ê Hezîranê ya ser avayiya Partiya Demokratîk ya Gelan (HDP) ya li Izmîrê ku di encamê de Deniz Poyraz şehîd bû, bertek dewam dikin. Rûken Ehmed diyar kir ku, ji ber jin li hemberî desthiladaran disekine û doza avakirina jiyaneke hevbeş dike, rastî êrişên faşîzmê tê.**




**Dilîn EHMED/Qamişlo**

Deniz Poyraz 17’ê Hezîranê ji aliyê kujerê dewleta tirkî ya dagîrker ve, bi awayekî hovane li avayiya HDP’ê ya Izmîrê hat kuştin. Li dijî siyaset û hovîtiya dewleta tirkî ku parti û kesayetên demokrat dike hedef, herwiha şideta li ser jinê rewa dike û kujeran diparêze, li seranserê cîhanê gel bi çalakiyên cuda nerazîbûna xwe nîşan dide.

**“Li hemeberî êrişan, emê têkoşînê xurt bikin”**

Endama Komîteya Têkiliyên Dîplomasiyê ya Kongreya Star Rûken Ehmed derheqê mijarê de ji me re axivi û got, em jinên bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî jinên Kurd, ji bo Deniz Poyraz soza geşkirina têkoşînê didin û axiftina xwe wiha domand: “Destpêkê em ji malbata şehîd Deniz Poyraz û tevayiya şehîdên azadiyê re, sersaxiyê dixwazin. Ne tiştekî nû ye ku jin bi destê desthildaran bi awayekî hovane tên kuştin. Eger em vegerin dîrokê emê bibînin berî hezarê salan ji ber ku jin doza mafê xwe dike dibe hedefa êrişan. Bi taybetî siyaseta dewleta tirkî ku eşkere xuya dike, dixwaze careke din împeretoriya Osmaniyan vegerîne. Lê weke ku niha li ber çavan tê dîtin, jin ji



bo têkbirina planên dewleta tirkî rojbiroj têkoşîna xwe xurttir dike û her dem soza xwe nû dike. Em moral ji berxwedana jinên xwe yên têkoşer digirin. Her ku şervanek yan jî berxwedêrekî me şehîd dibe, em hê pirtir eşqî têkoşînê dibin. Em soza tolhildana şehîd Deniz, Hevrîn, Sakîne û tevayiya şehîdên Kurdistanê didin. Em ti carî keda wan ji bîr û wenda nakin.”

**“Bi saya ramanên rêbertiyê me xwe nas kir”**

Rûken teqez kir ku bingehê siyaseta dewleta tirkî qirkirina çanda gelê azadîxwaz e û bi van gotinan axaftina xwe domand: “Dewleta tirkî wek parêzvana ola islamî xwe ji cîhanê re dide xuyakirin. Herwiha mirovan jî bi vê dixapîne. Lê tiştên ku dike tersê vê ye. Ola islamê ji cewherê wê derxistine û li gorî berjewendiyên xwe didin meşandin. Li hemberî vê siyasetê jinên Bakur serê xwe hildidin û li kû derê bin li hemberî şidetê li ber xwe didin. Lewra me jinan bi fikir û felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, xwe bi rêxistin kiriye û heta bidestxistina mafê jinan emê têkoşînê bikin.”

Rûken da zanin ku şahadeta her jineke azadixwaz, têkoşina wan ya azadiyê û ya li li diji şideta faşîzmê xurttir dike û wiha got: “Armanca dijmin ji kuştina jinê ew e ku, vîna jinan bişkîne. Lê jinên me bi taybetî jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, bi destpêkirina şoreşa Rojava hêza xwe ji jinên berxwedêr girtine û digirin. Di êrişa ser Şingalê de çeteyên DAIŞ`ê xwestin bi rêbazên xwe yên hovane bi revandin û kuştina jinên me yên Êzîdî, vîna jinan bişkînin. Lê jinan bi berxwedana xwe ev plana wan têk bir. Niha jî em ji jinên di greva birçîbûnê de û ji şehadeta hevalên jin, hêza xurtkirina têkoşînê, digirin.”

**“Destkeftiyên şoreşê biparêzin”**

Endama Komîteya Têkiliyên Dîplomasiyê ya Kongreya Star Rûken Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji bo misogeriya destkeftiyên jinan, pêwîstî bi parastina wan heye. Bi avakirina Rêveberiya Xweser re, jinên bakur û rojhilatê Sûriyê, di her sazî û rêxistinê de bû pêşeng. Ev tê wê wateyê ku fikirê rêbertiya me jiyaneke wekhev dide avakirin û jinan ji bindestiyê rizgar dike. Banga min ji jina re ew e ku, moral ji berxwedana hevalên şehîd bigirin. Her gav em soza şopa şehîdên xwe nû dikin. Ji bo pêkanîna xewn û xeyalên wan emê heta dawiyê li ber xwe bidin.”

# “Koma Sakîne berhema ked û têkoşîna jinê ye”

**Darîn Silê/Qamişlo**

**Tevî zor û zehmetiyên dibîne jin di her warê jiyanê de xwedîrol e û heta niha çand û destkeftiyên xwe diparêze. Bi taybetî jina Kurd di her qada jiyanê de têkoşînê dike. Herwiha bi keda jinê û bi têkoşîna hevrê Sakîne û hevalên mîna wê, “Koma Şehîd Sakîne” bi deng û rengê jinê hunera xwe pêşkêş dike.**

Rêvebera Koma Ş. Sakîne, Gulistan Îbrahîm li ser avakirin û binavkirina komê ji me re wiha axivî: “Koma Ş. Sakîne ji 2014an ve hatiye avakirin. Dema şehadeta hevrê Sakîne û her du hevalên wê Leyla û Fîdan, wek hevalên jin em li hev civiyan û me biryar da komeke xweser bi navê Şehîd Sakîne ava bikin. Weke tê zanşn Sakîne Cansiz ji avakirina PKKê heta şehîdbûna wê (2014) li hemberî faşizma tirkî têkoşina azadiyê kir. Herwiha pêşenga PKK û PAJKê bû. Hevala Sakîne ji bo têkoşina azadiya jinê û jinên şoreşger bû ronî, li zindana Amedê bû kelemê çavê dijmin û bi berxwedana xwe hêza vîna jina azad gihand lûtkeyê. Hevala Sakîne hêza di hundirê jinê de dida avakirin û ji jinên cîhanê re bû pêşeng. Ji bo wê em dixwazin li ser navê wê, bi hunera xwe layiqê wê û şopdarên wê yên şoreşger bin.”

“Jin civakê ava dike û civak jî bi jinê ava dibe”

Gulistan bal kişand ser êrişên dewleta tirkî ya faşist û da zanîn ku ku armanca dijmin qirkirina Kurdan û jinê ye û axaftina xwe wiha domand: “Bi dehan jinên me yên siyasetvan, şoreşger û hunermend ji ber hêz û vîna wan ya xurt, bûne hedefa dijmin û şehîd bûne. Jin civakê ava dike û civak jî bi jinê ava dibe. ji ber wê dixwazin her tim jinê bikin hedefa xwe û tine bikin. Lê bi saya rêber Apo û bi fikir û ramanê wî jin gihîşt asta herî bilin û bûye jineke têkoşer. Îro



jin bi riya têkoşina hevalên weke Sakîne Cansiz li hemberî dijmin têkoşina azadiya jinê dikin û civakê ji êrişên faşizmê diparêzin. Niha jî jin di her qada jiyanê de cih girtiye û li ber xwe dide. Jin bûye şoreşger, rojnamevan, hunermend û çanda xwe jî diparêze.”

Gulistan da diyarkirin ku bi ked û



têkoşîna jinê komeke xweser bi navê Ş. Sakîne dane avakirin û wiha pê da çû: “Ji ber ku komên xweser tinebûn, piştî şehadeta hevala Sakîne me xwest komeke taybet ji bo jinê bidin avakirin, da ku em hêza jinê nas bikin û hunera wê diyar bikin. Despêka avakirina komê em heşt hevalên jin tevlî bûn. Wê demê me gelek perwerde dît, hem ya deng hem jî ya sazê. Stirana me ya depêkê wek deng û dîmen li ser YPJê bû. Piştî wê bi demekê me stiraneke bi dengê jinê li ser Şehîd Sakine çêkir. Ji wê demê ve me gelek stiran bi denê Koma Sakîne gotine. Stiranên me tev yên folklorî û şoreşgerî ne.”

Rêvebera Koma Ş. Sakîne, Gulistan Îbrahîm got, em tevlî tavayiya program û çalakiyên heyî, bi taybetî yên girêdayî jinê dibin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em hewl didin jimara endamên xwe zêde bikin da ev kom pêş bikeve û demên pêş bi deng û rengê jinê stiranên nû pêşkêşî gelê xwe bikin. Herwiha bi dengê xwe bibin parçeyeke vê şoreşê.”

# Di hedefa dewleta tirkî de siyasetmedarên jin yên Kurd hene

**Kongreya Star ya Herêma Firatê bi daxuyaniyekê êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên li dijî gundê Helincê yên par ku di encama wê de komkujiyek çêbû û 3 jin bûn qurban, şermezar kirin û diyar kir ku armanca êrişan jinên azad in.**

23`yê Hezîrana 2020`an balafireke bêpîlot ya dewleta dagîrker ya tirkî malek li gundê Helincê yê başûrê rojhilatê bajarê Kobanê kir amanc û di encamê de du endamên Koordînasyona Kongreya Star ya Herêma Firatê Zehre Berkel û Hebûn Mele Xelîl û xwediya malê Emîne Weysî şehîd bûn.

Têkildarî mijarê Kongreya Star ya Herêma Firatê bi daxuyaniyekê komkujî şermezar kir.

Daxuyanî li Goristana Şehîd Dîcle ya başûrê Kobanê hat dayîn û ji aliyê Selme Simê ve ku dewreya şehîdên komkujiya Helincê bi dawî kiriye hat xwendin. Tê de bi dehan endamên Akademiya Şehîd Şîlan û kesên dewreya Şehîdên Komkujiya Helincê bi dawî kirine amade bûn.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Êrişa ku dewleta dagîrker ya tirkî pêk anî armanc jê ew e ku jina azad û azadiya gelan bike amanc. Dewleta dagîrker tevayiya rêbazên hovane û qirkirinê dide meşandin.

23`yê Hezîrana 2020`an bi balafireke bêpîlot li gundê Helincê êrişek pêk hat. Di encamê de 3 jinên têkoşer şehîd bûn. Ev sûcek e ku li pêşiya çavên cîhanê û rêxistinên mirovî yên ku parastina mafên mirovan dikin pêk hat. Ev êriş hê jî li çiyayên azad, Rojava, bakurê Kurdistanê, Girê Spî, Serê Kaniyê û Efrînê dewam dikin.

Dewleta tirkî ya dagîrker bi riya çeteyên xwe jinên ku hewl didin projeya neteweya demokratîk pêk bînin, mîna Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Agirî, Zehre Berkel, Hebûn Mele Xelîl, dayîka Emîne, Denîz Poyraz, dike amanc.

*ANHA*



# “Itîlaf ji bo pêkanîna berjewendiyên Tirkiyê alavek e”

Endama Meclisa Serokatiya MSD`ê Fehîme Hemo got, qaşo Itîlafa Sûrî ya neniştimanî veguheriye alaveke sîxuriyê. Derbasî herêman dibe û xizmeta dewleta tirkî ya dagîrker dike.

Serokê qaşo “Itîlafa sûrî” yê bi navê Nesir El-Herîrî di daxuyaniyên hefteya borî de bang li dewleta tirkî ya dagîrker kir ku li gel çeteyên qaşo “Artêşa Nîtimanî” destwerdana leşkerî li Til Rifet, Minbic û tevayiya herêmên Sûriyê bike.
Ev daxuyanî ji aliyê gelê sûrî ve hat redkirin, lewra xiyaneteke eşkere ya li hemberî xwediyên erd ên resen e û ew bang hatin redkirin.
Têkildarî vê mijarê Endama Meclisa Serokatiya MSD`ê Fehîme Hemo diyar kir ku helwesta Itîlafa Sûrî ya li hemberî gelê sûrî şermek e.
Fehime Hemo itîlaf bi neniştimanî bi nav kir û got, li gorî armancên xwe yên parastina gelê Sûriyê tev nagera.
Fehîme Hemo wiha got: “Lê tişta ku me di pratîkê de dîtiye, rêgezên ku li ser bingehê wê itîlaf hatiye avakirin, dijber in. Me dît ka çawa li gorî berjewendiyên Tirkiyê tev digere û bû parêzvana yekê ya siyaseta dewleta tirkî ya li dijî gelên herêmê.”

**“artêşeke sîxur e, ne niştimanî ye”**

Têkildarî siyaseta dewleta tirkî ya li herêmê Fehîme Hemo axaftina xwe wiha domand: “Siyaseteke berfirehkirinê ye ku dîrok û hebûna gelê herêmê dike armanc, mînaka wê jî dagîrkirina erdê Sûriyê ye. Dewleta tirkî bi piştgiriya qaşo Artêşa Niştimanî ku di rastiya xwe de ne niştimanî ye, sîxur e û nûnertiya vîna gelê Sûriyê û daxwazyên wan nake, herêmên Sûriyê dagîr kirin.”
Têkildarî bikaranîna dewleta tirkî ya çeteyên qaşo “Artêşa Niştimanî ya Sûrî” ji bo xizmeta xwe, Fehîme Hemo wiha pê de çû: “Dewlweta tirkî bi riya wan çeteyan bakurê Sûrî dagîr kir. Rejima tirkî ji bo garantiya berjewendiyên xwe wan bi kar tine. Çi li Libya çi li herêma Qerebaxê be. Raporên medyayê yên dawî îşaret pê kir ku dewleta tirkî ew çete ji bo êrişên li dijî başûrê Kurdistanê û Iraqê şandin.”

**“Itîlaf alaveke Tirkiyê ya berfirehkirinê ye”**

Fehîme Hemo diyar kir ku daxuyaniyên Nesir El-Herîrî yên dawî yên têkildarî banga ji Tirkiyê re ku herêmên Sûriyê



dagîr bike, isbat dike ku itîlaf bûye amûreke çetetiyê di destê dewleta tirkî de.
Endama Meclisa Serokatiya MSD`ê îşaret bi herêmên dagîrkirî kir ku bûne qadên revandin, kuştin û wêrankirina binesaziyê û tevayiya rêbazên dijmirovî li pêşberî çavên civaka navneteweyî û nûnerên Itîlafê pêk tên û ev li axaftina xwe zêde kir: “Civaka navneteweyî û nûnerên itîlafê ti helwestê li hember van sûcan nîşan nadin.”

**DIYALOG ÇAREYA HERÎ BAŞ E**

Fehîme Hemo wiha dirêjî da axaftina xwe: “Em nûnerên gelê Sûriyê israr dikin ku armanc û vîna me bi rIya diyalogan pêk tê. Ji ber ku diyalog riya yekane ya çareserkirina aloziya ku welat ji beriya deh salan ve tê re derbas dibe.”
Fehîme Hemo li dawiyê bang li itîlafê kir ku dev ji ximzetkirina dijminên gelê Sûriyê û dagîrkeran berde. Herwiha bang li tevayiya aliyên mûxalif kir ku civînekê li dar bixin, da ku çareyekê ji bo gelê Sûriyê bibînin û mafên wî misoger bikin.
*ANHA*

Ji nêz ve

## SÛRÎ BER BI KÛ VE DIÇE?

**Ednan Mustafa**

Di ser hilbijartina serokkomarê Sûrî Beşar El Esed re mehek derbas bû. Lê ne di siyaseta derve ya Sûrî û ne jî di ya hundir de ti guhertin nehatine kirin. Lê berî ku em behsa guhertin û veguhertinên siyaseta Sûrî bikin, divê bê zanîn ku El Esed hê Kabîneya xwe ya hukumetê diyar nekiriye. Gelo avakirina kabîneya nû ya rêjima Sûrî, wê bi xwe re guhertinê di Sûrî de bîne? Bi qasî guhertin ji bo Sûrî pêwîst in, hinde jî divê bê zanîn ku ev guhertinên mijara gotinê wê di xizmeta kijan alî de bin û li gorî percewendiyên kîjan hêzên ku Sûrî dagîr kirine de bin. Helbet bersiva van pirsan di xetên qalind de tên zanîn, lê hûrdekariyên wê çi ne û wê çawa be jî divê bê naskirin.
Li gorî hin agahî û şîroveyên siyasî di kabîneya nû ya El Esed de wê zêde endamên partiya Bees tê de nebin. Rêjima Şamê wê giraniyê bide kesayetên “serbixwe” û neteweuên cuda ku di Sûrî de dijîn. Weke Suryan, Ermen, Durzî û Kurdan. Helbet ev kesên ku ji van neteweyan werin erkdarkirin, gelo çiqas ji bo neteweyên xwe û tevayiya Sûrî kar kirine, cihê lêkolîn û lêgerînê ye.
Ev nêzîkatî û fikrandin çendî rast e yan şaş e hê ne zelal e, lê di beweriya me de, wisa jî fikrandin piştî 10 salan ji Şoreşa Sûrî ev jî serkeftinek e. Lewra mucered fikrandin dûrxistina partiya Bees ji kabîneya hikumetê tê wateya guhertinê û ev incazek e. Li ser dûrxistina partiya desthiladar ji avakirina hikumeta nû nayê wê weteyê ku desthildariya partiya Bees lewaz bûye, berûvajî vê yekê, Bees hê zêde bi awayekî sazûmanî û bi qalikên cuda xwe di nava rêjima Sûrî de bi cih dike. Hîn zêde bi nihênî, eger gotin di cih de be weke dewleta kûr wê kar bike. Em nikarin careke din derketina Beşar El Esed di hilbijarina 26ê Gulana îsal û dûrxistin yan qelskirina rola partiya Bees ji hikumeta nû ya Sûrî ku were avakin ji hev cuda bigirin dest. Gelê Sûrî di wê beweriyê de ye ku ev yek di encama lihevhatineke hêzên herêmî û navneteweyî de hatiye kirin. Hilbijartineke bi tewafûq di navbera Îran û Rûsan de ye. Îran bi israr bû ku El Esed di iqtidara xwe de bimîne û ev yek li berjewendiyên Rûsan bû. Di heman demê de Rûs di wê beweriyê de bûn ku careke din partiya Bees di hemû aliyan de di nava desthiladariya Sûrî de be di serî de Îran wê hin hevkarên xwe winda bike. Ji bo vê yekê li hemberî kêmkirina desthildariya Bees di nava hikumeta Sûrî de, rol û misyona Beşdar El Esed zêde kirin û hêştin careke din were hilbijaritin.
Di nava van hemû nêzîkatî û hevsengiya heyî de, gelo wê piştî hilbijartinê siyaseteke çawa bê şopandin? Di vê derbarê de di rojên destpêkê de diyar bû ku wê Rêjima Sûrî di polîtikaya xwe ya inkar û qirkirina li dijî Kurdan de berdewam bike. Tevlîheviya li bajarê Minbicê û dorpêça li ser Şehba û taxa Şêx Meqsûd nîşanên vê siyasetê ne. Ji bo vê yekê li gorî çavdêrên siyasî tê texmînkirin ku di rojên pêş de ev polîtîka zêde derkeve pêş û bixweze mûdexeleyî hin herêmên din yên Rêvebiriya Xweser bike û bi taybetî Rojhilatê Firatê. Bêguman ev nêzîkatiya inkar û êrişkar yên rêjîma Sûrî beşek ji polîtika Rûs li ser Kurdan e. Herwiha beşek ji êrîşên dagîrkeriya tirkî li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûrî ne.
Di vê çarçoveyê de, em nikarin êrîşên dagîrkeriya tirkî yên li dijî gelê Kurd ji nêzîkatiyên dijminane yên rêjima sûrî qut bigirin dest. Dema mirov hatûçûna dîplomatîk temaşe dike û pêkhatinê li ser erdê dibin vê yekê nîşanî raya giştî dike.

# Mistefa Îto: Komkujiya Kobanê dewama komkijiyên Kurdan e

**Hevserokê Meclisa Kantona Kobanê Mistefa Îto got, di dîrokê de gelek komkujî li dijî Kurdan hatine kirin û sûcdar yek e. Komkujiya Kobanê jî berdewamiya komkujiya Dêrsimê ye. Bêdengiya Koalisyona Navneteweyî jî cesaretê dide Tirkiyê ku xeta xwe ya xwînrij bidomîne.**



Di dîroka her neteweyê de rojeke reş heye, lê li dijî neteweya Kurd gelek komkujî hatine kirin. Ji wan; komkujiya berbanga 25’ê Hezîrana 2015’an e ku çeteyên DAIŞ’ê li dijî sivîlên li bajarê Kobanê û gundê Berxbatan pêk anîbûn. Di encama vê komkujiyê de zêdetirî 333 sivîlî şehîd bûn.
Têkildarî mijarê hevserokê Meclisa Kantona Kobanê Mistefa Îto axivî û wiha got: “Me ji destpêkê ve dizanî ku DAIŞ bi serkêşiya Tirkiye li dijî Kurdan şer dike. DAIŞ ne tenê rêxistinek e da ku şer derxe, îdeolojiyek e ku Erdogan serkêşiyê jê re dike û armanc jê ew e ku zihniyeta gelên azadîxwaz yên li Rojhilata Navî tine bike.”
Mistefa Îto da zanîn ku li dijî gelê Kurd gelek komkujî hatine kirin, sûcdar yek e lê bi rûyekî din e û wiha domand: “Em nikarin dîroka komkujiyan ji hev parçe bikin yan jî têkoşîna Kurdan ya ji bo jiyaneke birûmet inkar bikin. Di heman demê de em nikarin komkujiyên ku li dijî Kurdan hatine kirin ji hev parçe bikin.”
Îto diyar kir ku komkujiya li Kobanê xaleke reş li rûyê mirovayiyê ye û tolhildana ji têkçûna DAIŞ’ê ye û wiha got: “Kesên ku li hemberî komkujiyê bêdeng man li pey vê komkujiyê ne, bi taybetî dewleta tirkî ku deriyê sînor yê Murşidpinarê vekir û derbasbûna çeteyan ya hundirê bajar re hêsan kir. “
Mistefa Îto axaftina xwe wiha domand: “Diviya dewleta tirkî bi destpêka şerê navxweyî li Sûriyê parastina sînorê xwe kiriba û nehiştiba ku terorîst derbasî herêmên Sûriye bibin. Lê deriyên xwe li pêşiya çeteyên DAIŞ`ê vekirin û derbasbûna wan ya ji Rojava re hêsan kir, ev tev de bi dîmenan belgekirî ne. Lewra dewleta tirkî dema demokrasî û jiyana hevbeş a pêkhateyan li Rojhilata Navîn dibîne tengezar dibe.”
Hevserokê Meclisa Kantona Kobanê îşaret bi komkujiyên li herêmê pêk tên kir û ev lê zêde kir: “Hemû komkujiyên ku li herêmê pêk tên destê Tirkiyê tê de heye, bêdengiya Koalisyona Navneteweyî cesaretê dide wê ku xeta xwe ya xwînmij berdewam bike. Kiryarên ku îro li Herêmên Parastinê yên Medyayê pêk tên berdewamiya komkujiya ku beriya çend salan li Kobanê pêk hat.”
Mistefa Îto da xuyakirin ku bêdengiya dewletên mezin a li hemberî hişmendiya dewleta tikrî û sûcên ku pêk tîne wê bi rehetî derbas nebe, lê belê dê Tirkiye li pêşiya wan bibe kelemek ji ber ku ji hişmendiya DAIŞ`ê ne cudatir e ku armanca wa têkbirina çanda gelê herêmê û dîroka wan e.
Di dawiyê de Hevserokê Meclisa Kantona Kobanê Mistefa Îto bang li gelê Kurd kir ku li hemberî kiryarên dewleta tirkî û sûcên wê bêdeng têkoşînê geş bikin, her wiha bang li partiyên siyasî jî kir ku dev ji berjewendiyên xwe yên şexsî berdin, di berjewendiyên gelê Kurd de bifikirin û ewlehiyê ji wan re misoger bikin.
*ANHA*



# “Tecrîda li ser rêbertiyê tecrîda li ser tevayiya mirovayiyê ye”

Zelal Ceger: Dewleta tirkî dixwaze bi tecrîda girankirî ya li ser rêber Apo, fikrên azad ji holê rake

**Şivan Xelîl / Qamişlo**



Endama Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Zelal Ceger têkildarî encamên girankirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji rojnameya me re nirxandinên xwe kirin.
Endama TEV-DEM`ê Zelal Ceger di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Tecrîda li ser Rêber APO tê kirin, mirov dikare bêje tecrîda li ser mirovayiyê ye. Lewra di sedsala 21’ê de fikra alternatîf ya li dijî sîstema desthilatdar ya kapîtalîst, fikra rêber Apo ya Neteweya Demokratîk e. Ji bo wê dewletên hegemon bi riya nobedariya dewleta tirkî rêber Ocalan dîl girtin. Lê dîsa jî nikarîn pêşî li belavbûna pergala rêber Apo bigirin. Vê carê jî dest bi tecrîda girankiri ya dermirovî kirin.”
Zelal bal kişand ser pergala rêber Apo ya ku bi parêznameyên xwe li seranserê cîhanê belav kir û gotinên xwe wiha bi lêv kirin: “Rêber Apo pergala xwe ya Neteweya Demokratîk bi riya pirtûkên xwe bi gel da nasîn û bi van pirtûkan çavê gelên cîhanê gişan vekir. Rojbiroj felsefeya Rêber Ocalan di cihanê de dibe modela jiyaneke azad. Gel û kesên demokratîk û azadîxwaz encam ji vê yekê girtine û bûye modela sedsala 21`ê ku gel dixwaze li welatê xwe bi cih bîne. Wek mînak; felsefeya Rêber Apo ji bo akademîsyen û mamsoteyên zanîngehan pir girîng e û di vê felsefeyê de fikreke nû ku civakeke azad bikare tê de bijî, dibînin.”
Zelal Ceger di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Dewleta tirkî ji hevdîtina bi Rêbertiyê re ditirse. Lewra eger hevdîtin were kirin wê perspaktîfên rêbertiyê hem ji bo gelê Kurd, hem ji bo tevayiya gelên azadîxwaz derkevin pêş û her kes pêk bîne. Lewra civaka azadîxwaz û demokratîk tev serkeftina xwe di fikra Rêber APO de dibînin û ev jî ji bo faşîzma desthilatan metirsiyan ava dike. Ne dewleta tirkî tenê ji vê yekê ditirse, dewletên hegemon giş ji vê fikrê ditirsin. Ji ber vê jî destekê didin dewleta tirkî. Armanca wan ji vê yekê fikrên azad ji holê rakin. Lê rêber APO bi gelê azadîxwaz re ev plan bêbandor kir. Berxwedana ku rêber APO li Îmralî li hemberî vê sîstemê dimeşîne, berî her tiştî şeklê aştî û demokrasiyê derxist pêş. Herwiha ev berxwedan ji bo gel bû hêviya herî mezin ya serkeftinê.”
Endama Tevgera Civaka Demokrtîk (TEV–DEM) di dawiya axaftina xwe de ev xal anî ziman: “Ev komplo hat bêbandorkirin, lê hê jî didome. Berdewamiya wê di êrişên li ser rojavayê Kurdistanê, li ser bakurê Kurdistanê û li ser başûrê Kurdistanê ye. Herî dawî jî êrişî navenda HDP`ê kirin û hevaleke jin şehîd xistin. Ev jî weke nêzîkatiyeke acizbûn û nerazîbûna dewleta tirkî li hemberî têkoşîna li Îmraliyê tê meşandin, têkoşîn û berxwedana ku li çiyayên azad tên kirin û ji aliyê gelê Kurd û azadîxwaz ve tê meşandin e. Ji ber vê yekê jî dixwaze bi kiryarên xwe yên kuştin û tirsandinê gel lewaz bike. Lêbelê em dibînin ku gelê me li bakur û rojhilatê Sûriyê li derdora fikrên azad û fikrên rêbertiyê kom bûne. Ne tenê ji bo rakirina tecrîdê û Rêber Abdullah Ocalan ji nava 4 dîwaran rizgar bibe. Lewra her kes dizane ku azadiya rêbertiyê azadiya gelê bindest e û tecrîda li ser wî tecrîda li ser gelê azadîxwaz e.
Ji bo pêkhatina wê, divê em bikarin fikir û felsefeya rêber APO di tevayiya jiyana xwe û di sîstema xwe de pêk bînin. Wê demê emê bikarin destê Rêbertiyê xurttir bikin. Ji bo em rêberê xwe ji nava 4 dîwaran derxin divê 24 saetan em di nava kar û xebatê de bin.”

## 7 meh in girtiyên azadiyê di çalakiyê de ne

**Navenda nûçeyan**

**Girtiyên ji doza PKK û PAJK’ê ku li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û binpêkirinên mafan yên li girtîgehan dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribûn, 213 roj in li ber xwe didin.**

Çalakiya li Mexmûrê di roja 192. û ya li Yewnenistanê jî di roja 175. de dewam dike.
Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK’ê, 27’ê Mijdara 2020’an, ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku ev sala 23’an e li Girtîgeha Îmralî tê girtin û ji bo bidawîkirina binpêkirinên mafên mirovan yên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kiribûn. Çalakiya greva birçîbûnê ku ji aliyê koma 43. ve tê domandin, di roja 213 de dewam dike.
Mexmûr roja 192
Li Kampa Penaberan ya Şehîd Rustem Cudî (Mexmûrê), di çarçoveya pêngava “Dem Dema Azadiyê ye” de, 18’ê Kanûna 2020’an li dijî tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakiya greva birçîbûnê hatibû destpêkirin. Çalakiya ku



li Komeleya Malbatên Şehîdan ya Mexmûrê dom dike, di roja 192. de didome.
Yewnanîstan roja 175
Penaberên li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê jî ji bo bidawîkirina tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan dewam dike, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiribûn. Çalakî di roja 175. de didome. Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê pêşengiya çalakiyê dikin.

## Bizotnewey Demokrata Gelê Kurdistanê: Em li dijî şerê birakujî ne

Endamê Serkirdayetiya Hizba Bizotnewey Demokrata gelê Kurdistanê Xelî Mehmûd diyar kir ku bi her awayî li dijî şerê Kurd û Kurdan in. Herwiha got, divê di nava Kurdan de pêşî li şerê navxweyî were girtin û girîngiyê bidin aştiya navxweyî. PDK di siyaseta xwe ya Şerxwaz ya li dijî tevgera rizgarîxwaz ya gelê Kurd de bi israr e. Tevî bangên piraniya aliyên kurdî yên ji bo aştiyê jî PDK’ê hê hêzên xwe ji qadên gerîla venekişandine û rojane hêza xwe ber bi deverê ve dişîne.
Li ser vê mijarê Endamê Serkirdayetiya Bizotnewey Demokrata Gelê Kurdistanê Xelîl Mehmûd ji Rojnews’ê re axivî.
Xelîl Mehmûd da zanîn ku li gorî rewşa ku niha li her çar parçeyên Kurdistanê heyî û saziyên çapemeniyê behs dikin, metirsiya derketina şerê Kurd û Kurdan heye. Xelîl wiha got; “Em bi her awayî şerê birakujî red dikin û li dijî şer in. Ji bo ku şer çênebe emê li gel tevayiya hêz û aliyên din yên Kurdî bikevin nava hewldanan daku pêşî li vî şerî bigrin.”
Xelîl Mehmûd got, divê di nava Kurdan de pêşî li şerê navxweyî



were girtin û giringî bi aştiya navxweyî were dayîn. Herwiha da zanîn ku şerê navxweyî xizmetê ji neteweya Kurd re nake, dikeve di xizmeta dijmin û ziyanê digihîne gelê Kurd.
Xelîl Mehmud herwiha got, wek Bizotnewey Demokrata Gelê Kurdistanê em bang li tevayiya hêz û aliyên siyasî dikin, li şûna şerê navxweyî yekîtiya neteweyî ava bikin. Lewra yekîtiya neteweyî garantiya serkeftina me ye. Alî baş dizanin ku dewleta tirkî dagîrker e, dixwaze Kurd şerê hev bikin û ji hev dûr bikevin.”
Di dawiyê de Xelîl Mehmûd da xuyakirin ku tişta bûyî sedem ku ziyan bigihe gelê Kurd, jihevdûrketina wan e. Herwiha banga avakirina yekîtiya neteweyî kir û daxwazî kir ku tevayiya pirsgirêkan di nava aliyên siyasî yên her çar parçeyên Kurdistanê de bi diyalogê werin çareserkirin.
*ROJNEWS*



## Şerê Veşartî

**Faruk SAKİK**

Insiyatîfa Parastina Kurdistanê piştî serdana Başûrê Kurdistanê li Brûkselê daxuyaniyek da. Endamê Berê yê Meclisa Şaredariya Bajarê Cinêvê Tobia Schnebli di daxuyaniya xwe de wiha digot: “Ev şerê li Kurdistanê hatî jibîrkirin. Tişta min fêm kirî nehatî jibîrkirin, hatî veşartin.”
Bi salan e di navbera dewleta tirkî û gerîlayên Kurdistanê de şer heye. Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo raya giştî û dewletên ewropî ikna bike vî şerî wek “operasyon” pênase dike. Ev şerê bi dijmin re bû.
Di şerê bi dijmin re hin hêzên Kurdan jî hevkariya dijmin dikin. Ji şerê Zînê Wertê dest pê kirin û ev şer heta roja me dewam dike. PDK li hemberî ewqas hişyariyan yan jî lavaya ji civakê tê, dîsa di hevkariya xwe de israr dike. Ev şerê PDK tevlî bûyî ne şerê hatî jibîrkirin e. Şerê hatî veşartin e.
Her roj bi dehan konvoyên sewqiyata Herêmên Parastina Medya dihatin veşartin.
Her roj istixbarata Tirkiyê ya bi kinc û lojîstika PDK’ê li heremê cirît davêtin hatibû veşartin.
Hemû baregehên li qadên şer hatibûn çêkirin ku ji bo êrişên artêşa tirkî wek eniyekê bûn, hatibûn veşartin.
Di vî şerî de PDK bi dijmin re li dijî gerîla şer dike. Heta îro jî gerîla yek fîşek li dijî pêşmergeyan bi kar neaniye.
Gerîla îro karesetên mezin yên paşrojê dibîne û hişyariyê dide, da ku ev şerê Kurd û Kurdan dest pê neke.
PKK di bangên xwe de dibêje, me PDK iqna i qani nekir. Di şerê me yê li dijî dijmin de ji me re gelek dibin asteng. Bi hesasiyeteke mezin em hewl didin da ku pêşmerge zirarê nebînin. Dijmin jî ji vê helwesta me sûdê digire. Di eniyên dijmin êdî têk diçe de PDK ji wan re dibe nefes.”
Ev yek jî bû sedem ku di vê berxwedana mezin û dîrokî ya 60 rojî de 54 gerîlayên HPG û YJA-Starê jî şehîd bibin.
Ji bo vê yekê daxwaziya gerîla ji me, divê were cih. Divê zêdetir xebata pêşîgirtina şerê Kurd û Kurdan were xurtkirin.
Ji bo ev şerê veşartî bi dawî bibe û derbasî merheleya şerê Kurd û Kurdan nebe, divê PDK hêzên derbasî qada şer kirîn careke din paş ve bikişîne.
Rojbiroj PDK tenê dimîne. Ew hewldana PDK’ê ku dixwaze vî şerê veşartî mafdar nîşan bide bêencam dimîne.
Ji gelek sazî, partî, rêxistin û kesayetên navdar bi daxuyaniyan deklere kirin ku li dijî vî şerê veşartî ne. Bi taybetî li başûrê Kurdistan ev deng zêdetir bilind dibin. Lê divê jimara van pirtir bibe. Hemû Kurd helwesteke bi vî rengî nîşan bidin.
Ev şerê veşartî ne li dijî PKK’ê tenê ye. Dixwazin bi tinekirina PKK’ê doza azadiya Kurdistanê bi temamî ji holê rakin.
Ev biryara şerê li hemberî Kurdan li hin navendên weke NATO hatine dayîn.
Ji bo vê yekê jî di Insiyatîfa Parastina Kurdistanê de dostên Kurdan jî cih girtin. Têkoşîna dostên Kurdan û kesayetên ne Kurd ya ji bo ev şerê veşartî veneguhêre şerê Kurd û Kurdan ji bo me bibe berpirsyariyek. Dibe ku Kurd zêdetir bi xebateke mezin û bi israr vî şerê veşartî bi dawî bikin.
Eger xemsariyek hebe wê barê vî şerî tev bikeve ser milê gerîla. Gerîla jî ji bo jimara şehîdan bi 54an sînorkirî bimîne wê biryareke nû (ku em naxwazin hîç wan peyvan bi nav bikin) bide.
Eger em bi xwe bawer bin emê bikarin wisa bikin ku ev şerê veşartî veneguhere şerê Kurd û Kurdan.